

# Fîlma av û hewayê > Eko-sîstemên ku diguherin

Guherînên av û hewayê dê ser eko-sîsteman li her dera dinyayê bandorê dayîne ku ji wan cemser dê herî zêde bandorê wergirin. Ji niha va, em dûhatên wekî germtir bûna deryayan, helîna cemedada deryayan, çêbûna zêde ya planktonan û cibicibûna gûneyên jînweran dibînin. Em ê di demeka dirêj da rastî dûhatên tartir werin ku heya niha me mînakên wekî wan nedîtine.

Beriya ku hûn fîlmê bibînin, karên ku hûn gerek bikin ev in:

1. Eko-sîstem çî ye?
2. Ji pênc eko-sîsteman pênc mînakan bînin.
3. Kîjan ajal taybet bo eko-sîstemên cemserê ne?
4. Dema ku germahî zêde dibe, li gorî we çî tê serê eko-sîstema cemserê?

Erk û karên têkildarî fîlmê:

1. Çima di van salên dawîn da berhemanîna sereke li pehnava cemserê da zêde bûye?
2. Li Pehnavaya Cemserê jiyana ajalan çawan diguhere?
3. Eger pehnav esîdî bibin, dîhatên wê yê çî bin?
4. Li kîjan waran da berzaê avê girêdayî cemedada deryayê ye?
5. Av û hewayê germtir dê bibe sebaba berf yan barana zêdetir li cemserê. Li şûnê jî, ev yek dikare bibe sebeb ku berf li bihara derengî yan destpêka biharê bihele. Elîzabêt Kûpêr azmayîşek pêk aniye ku dûhatên dereng heliyana berfê diyar bike. Bibêjin ka wê çawan ev azmayîş pêk anî?
6. Bibêjin ka eger berf dereng bihele, ew ê çawan ser jiyana ser erdê û eko-sîstemên din bandorê dayîne.
7. Bibêjin ka tundra (deverên bê dar û cemidî) çawan li hevgerêdana karbonê bandorê datîne û eger berf demeka dirêjtir ji berê ser tundra dapoşîne, ev yek çawan dikare biguhere?

Erk û karên xurtbûyî:

1. Nivîseka kurt binivîsin ku nîşan bide çawan hokarên ne-biyotîk li cemseran guherîne û ev yek çawan ser hokarên biyotîk bandorê datîne. Hûn dikarin planên xwerû bikişînin yan wêneyên ku têkildarî nivîsê bin amade bikin.
2. Çima hûn fikir dikin ku eko-sîstemên cemseran ji yê deverên din ên cîhanê pirtir ziyane dibînin?